şopdara rastiyê ye
Ronahî
Hejmar : 417 nameronahi@gmail.com 20 - Tîrmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Şoreşa Rojava ya 19'ê Tîrmeh'ê



Rojava ku beden/beşa herî biçûk a Kurdistanê ye, 19'ê Tîrmeha 2012'an ji Kobanê Şoreşa Rojava diyarî tevahiya cîhanê kir.
Sosyalîst û rojnamevanê Amerîkî John Reed sala 1917'an şahidî ji Şoreşa Cotmehê ya li Rûsyayê re kir. Û piştre ev şahiya xwe kir berhemeke nemir. Navê berhemê wiha bû: "Deh rojên ku cîhan hejand"
Di nava van deh rojan de çîna karker bi serketinê derdiket ser dika dîrokê û hesabê hezaran salan dipirsiya. Lewma di vê pêvajoyê de ku her kêliya wê hejîner bû, deh rojan têrê dikir ku cîhanê şok bike. 19'ê Tîrmeha 2012'an jî ji aliyê gelek kesî ve weke rojeke ji rêzê dikare bê dîtin. Lê rastî ne bi vî rengî ye! Eger mirov bixwaze vê demê bi hevokekê pênase bikin, dikarin bêjin: "Roja ku Rojhilata Navîn hejand".
Lewma 19'ê Tîrmehê ji her alî ve dîrokeke bi hêvî ye.
Rojava ku beden/beşa herî biçûk a Kurdistanê ye, 19'ê Tîrmeha 2012'an ji Kobanê Şoreşa Rojava diyarî tevahiya cîhanê kir. Çarenûsa 3 milyon Kurdan a ku bi salan di bin dagirkeriya rejîma Sûriyeyê de bûn, weke serhildaneke li dijî statukoya netewe-dewletê derkete holê û veguherî şoreşê.
Tevgera Beasê nûneriya nijadperestiya Ereban dikir û ber bi dawiya salên 1950'î ve hêza xwe zêde kir û bi derbeya sala 1963'an re hate ser desthilatdariyê. Hafiz Esad ê ku ew ê mora xwe li nijadperestiya Ereban û desthilatdariya Beasê dabû, piştî ku di sala 1971'an de bi dengdana gel bû serokê dewletê ji bo pêkanîna polîtîkayên xwe zend û bendên xwe bada. Dînamîkên kom û civatî yên ku li dijî rejîma wî derdiketin jî zext li wan kir. Esad di nav sînorê welat de xwest nasnameyeke Sûriyeyê bide hemû kesan û lêgerîna nasnameyê ya beşên civakî jî bi zor û zextan asteng kir. Beas a ku 49 salan desthilatdar bû, di hemû pêvajoyan de gelê Kurd wekî 'xetereyeke potansiyel' û 'hêmana herî bi xetere' pênase dikir û polîtîkayên xwe gorî vî tiştî ava kir.
Herêma Cizîrê ber bi dawiya salên 1950'î ve bi koçên gelê Kurd re, hejmara Kurdan li wê derê 300 hezar derbas kir. Rejîmê biryar da ku li herêma Cizîrê nifûsê hilbijêre û di encama vî tiştî de nêzî 200 hezar Kurd bûn biyanî û mafên wan ên hemwelatîbûnê ji destê wan hate stendin.
Polîtîkaya wisa hate pêkanîn ku Kurdên li herêmê dijîn di nav Sûriyeyê de werin belavkirin û li hemberî vî tiştî Ereb li van herêman werin bicihkirin. Bi vî tiştî re hate xwestin li herêma Kurdan 'Kembera Ereban' were çêkirin. Lê dema ku Kurd bi berxwedanê re li dijî vî tiştî derketin, rejîma Beasê piçekî be jî bi paş ve gav avêt.








Rejîm a ku nekarî Kemera Ereban ava bike, şertên jiyanê yên Kurdan roj bi roj girantir kir. Weşanên bi Kurdî û axaftina bi Kurdî qedexe kir, navên cihan ên bi Kurdî kir Erebî. Rejîmê di sala 1963'an de wekî Plana Islahata Şarkê ya Tirkiyeyê hin polîtîka xist meriyetê û 12 xalên qirkirinê da destpêkirin. Yek ji van jî xalîkirina herêmê û bicihkirina Ereban a li herêmê bû. Ya din jî ev bû ku bênasname were hiştin û wekî hemwelatî neyên qebûlkirin. Beas a ku dixwest desthilatdariya xwe di asta mîkro de jî bi cih bike, di navbera du gundên Kurdan gundekî Ereban da bicihkirin û erdên Kurdan ji destê wan girt. Lê ev plan baş nehate kirin. Ji ber berxwedana li hemberî vê biryarê hikumetê bi paş ve gav avêt. Li hemberî vî tiştî şertên Kurdan roj bi roj girantir bû û mafê wan bi paş ve çû."
Piştre jî pêvajoyên giran li ser Kurdan hate pêkanîn.
Di Sînemaya Amûdê de qirkirinek pêk hat û 300 kes hatin qetilkirin. Hovîtiya Girtîgeha Hesekê hê jî tê zanîn. Di Adara 1993'an de 65 Kurdên ku piraniya wan siyasetmedar bûn, di odeyekê de hatin şewitandin. 65 girtiyên Kurd hatin qirkirin.
Di 11'ê Adara 2004'an de li Qamişloyê li dijî gelê Kurd qetlîamek hate kirin. Qirkirina li stadyûmê domiya û bi rojan êrîş hate kirin. Di van êrîşan de 36 kesan jiyana xwe ji dest dan, herî kêm 100 kes birîndar bûn û nêzî hezar êşkence li wan hate kirin. Li hemberî vê qetlîama rejîma Beasê gelê Kurd PYD ava kir û bersiv da qetlîaman.
Qetlîama Qamişloyê destpêkek e. Dînamîkên 19'ê Tîrmehê di vê dîrokê de veşartiye.
Rojava a ku parçeyê herî biçûk ê Kurdistanê ye, di 19'ê Tîrmeha 2012'an de ji Kobanê Şoreşa Rojava diyarî cîhanê kir.Qedera 3 milyon Kurdên ku di bin dagirkeriya rejîma Sûriyeyê de bûn, bi berxwedanê re bû şoreşek.
Beriya her tiştî divê mirov diyar bike ku dîroka destpêka Şoreşa Rojava 1979 e. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji ser sînor derbasî Kobanê bû, destpêka bingehîn ev e. Nêzî 20 salan li Rojava û Sûriyeyê Ocalan ked ked da û sînerjiya ku li vê derê daye avakirin, tevgerîn û destkeftin di sala 2012'an de şênber bû.
Di sala 1920'an de Sûriye û Fransayê şer kir û di vî şerî de têk çû. Ji ber vê jî Sûriye 26 salan di bin mêtinkariya Fransayê ma lê di sala 1946'an de serxwebûna xwe bi dest xist. Ji vê salê heta salên 1970'ê ji ber derbeyan ji kaosê rizgar nebû. Bi avakirina Komara Ereban a Yekgirtî (1958-1961) jî bi ser xwe ve nehat û bi derbeya Beasê re rejîmeke nû dest pê kir.
Karê destpêkê yê vê rejîmê ev bû ku bi sed hezaran Kurdan ji hemwelatîbûnê derxe. Kurdên ku ji hemwelatîbûnê hatin derxistin û zarokên wan ji tu mafan sûd wernegirtin û îzole bûn. Ji serdema malbata Esad a ku di sala 1971'an de desthilatdarî bi dest xistin, nasnameya Kurd ji gefên çandî û siyasî rizgar nebû. Li Rojhilata Navîn bi 'Bihara Ereban' re rêveberiyên dîktatoryal ên ku kesî nedipa ku werin hilweşandin, hatin tasfiyekirin. Li Tûnûs, Misir, Lîbya, Sûriye û li welatên din ên Rojhilata Navîn li dijî rêveberiyên otorîter gel daketin qadan. Gelan daxwazên xwe yên polîtîk û hêrsa xwe ya civakî ji ber ku nekarîn bikin pêşengiya şoreşeke demokratîk, kaoseke mezin pêk hat. Hêzên navneteweyî û herêmî hêrsa dîrokî ya gelan ên ku ji bo azadî û demokrasiyê daketibûn qadan, ji bo berjewendiyên xwe dîzayn kirin û bi 'diziya şoreşê re' tevlî Bihara Ereban bûn. Bi taybetî di şerê navxweyî yê Sûriyeyê de, hêviyên gelan ên azadî û demokrasiyê ji aliyê hêzên paşverû hate herimandin. Lê gelê Rojava ê ku li Sûriyeyê ketibûn bîreke bêbinî û bi salan înkar û asîmîlasyon li ser wan hatibû kirin, bi saya hêza demokratîk û danheviya têkoşîna salan, 'Bihara Ereban' veguherandin şoreşa Neteweya Demokratîk.
Beriya îlana şoreşê jî bêguman pêşketinên girîng pêk hatin!
Wekî ku tê zanîn li bajarê Derayê di Adara 2011'an de protestoyên ku li Sûriyeyê hatibûn destpêkirin, geştir bû. Li Rojava jî gel ên ku di şerê navxweyî yê Sûriyeyê de nebûn alî û ji dêvila vî tiştî 'xeta sêyemîn' ava kirin, dest bi avakirina jiyana azad kirin. Ji bo gava pêşîn Peymannameya Civakî ava kirin a ku dihat wateya Destûra Bingehîn a Rojava. Pêre jî li Kobanê, Cizîr û Efrînê kanton îlan kir. Kanton piştî qebûlkirina destûra bingehîn hatin ava kirin. Di 21'ê Çileyê de ya Cizîrê, di 27'an de ya Kobanê û di 29'an de jî ya kantonên Efrînê hatin îlankirin. Rêveberiyên Kantonên Xweser ên Demokratîk (Cizîr, Kobanê û Efrîn) parçeyekî axa Sûriyeyê ne. Li her kantonê Meclîsa Zagonsaz, Meclîsa Rêveber, Komîseriya Hilbijartinê ya Bilind, Meclîsa Destûra Bingehîn a Bilind û Meclîsên Herêmê hene. Ev kanton nikarin tevlî karê navxweyî yên dewletan bibin, mafê cîrantiyê diparêzin û ji bo çareserkirina kêşeyan jî xwe dispêre rêya aştiyane. Ev her sê kanton mafê wan heye ku ala, amblem û sirûdên xwe ava bikin.
Modela ku li Rojava derketibû holê, pergala 'Xweseriya Demokratîk' bû. Heke neteweya demokratîk giyanek be, xweseriya demokratîk jî beden e. Xweseriya demokratîk awayê şênber ê avakirina neteweya demokratîk e.
Di destpêka vê şoreşê de hate gotin, kana desthilatdariyê gel e, gel xwediyê destilatdariyê ye, bi rêya sazî û meclîsên ku bi hilbijartinê diyar kiribû, rêveberiyê pêk tîne. Rêveberiyên li derveyî Peymannameya Civakî ya Rêveberiyên Xweseriya Demokratîk ne meşrû ne. Kana desteyên meclîs û rêveberiyê, gel e. Nayê qebûlkirin ku ev tişt di destê kesekî an jî di destê komekê de be. Şoreşa Rojava, şoreşa demokrasiya radîkal e. Ji ber ku li Rojava civak xwerêxistinkirina xwe bi şandilxwazî û hevgirtinê gav bi gav ava dike. Bi tevlêbûna hemû qad û beşên jiyanê, li ser şîara komunalbûnê xwe birêxistin kir. Komîsyonên ku gel ava kiribû li her qada jiyanê, bi awayekî demokrasiya radîkal veguherand û alternatîfa demokratîk a sedsala 21'an li Rojava derket holê.
Şoreşa Rojava şoreşa jinê ya herî bi wate ye. Li her qadên jiyanê jinan cih girt. Di hemû pêvajoyan de jin hebûn. Him di tasfiyekirina rejîma Beasê de û him jî di avakirina demokrasiya radîkal, jin bûn hêmana sereke.
Li Rojava ya ku çemên Dîcle û Firatê derbas dibe; Kurd, Ereb, Asûr, Siryan, Ermen û Çeçen kanton kirin baxçeyên gel û qadên jiyanê. Lê ji roja ku pergala xwe îlan kirin, her roj êrîş li wan tê kirin.
Şoreşa Rojava ya ku piştî îlanê 6 sal li pey xwe hişt, ji her aliyê cîhanê kes kişand ba xwe û bûye mîrateya mirovayetiyê ya ku hê jî baweriya xwe bi demokrasî, têkoşîna jiyaneke alternatîf û berxwedanên alternatîf tîne û ji ber tiştan dikeve heyecanê.

şopdara rastiyê ye
Ronahî
nameronahi@gmail.com Hejmar : 417 20 - Tîrmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Li başûr û bakur 14 leşker hatin kuştin



Çalakiyên gêrîlayên HPG'ê yên li dijî artêşa tirk ya dagirker bê navber didomin. Li bakur û başûrê Kurdistanê gêrîla derbên giran li artêşa dagirker didin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê daxuyaniyek da û diyar kir ku li herêma Barzanê 5 û navçeya Çelê ya Colemêrgê jî 9 leşkerên Tirk hatine kuştin. *R-2*

# ŞOREŞA ROJAVA RÊYA DEMOKRATÎKBÛNÊ VEKIR



## ŞOREŞ JI HER DEMÊ BI HÊZTIR E

Salvegera Şoreşa Rojava ya 19'ê Tîrmehê li seranserî Rojavayê Kurdistanê bi çalakiyên bi heybet tê pîroz kirin. Pîrozbahiya herî bi heybet li navenda berxwedanê ya ku 19'ê Tîrmehê lê hat destpêkirin Kobanê pêk hat. Her wiha PKK'ê, Kongra Gel, PYD'ê, YPG'ê û sazî û rêxistinên din yên Rojava jî bi peyaman salvegera Şoreşa Rojava pîroz kirin. Di peyaman de hat gotin ku şoreş bi awayekî hê xurttir dewam dike.

## 19'Ê TÎRMEHÊ ÎRADEYA JIYANA AZAD E

Komîteya Rêveber a PKK'ê bi wesîleya salvegera Şoreşa Rojava ya 19'ê Tîrmehê daxuyaniyeke nivîskî weşand û got, "19'ê Tîrmeha ew roj e ku gelê Rojavayê Kurdistanê biryardarî û îradeya xwe ya ji bo jiyana azad nîşan daye. Em pê bawer in ku di sala heftemîn a Şoreşa Azadiyê ya dîrokî de wê gelên Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê, têkoşîna Sûriya demokratîk û Kurdistana azad ji her alî ve xurt bikin." *R-4*

## Şoreşê ji Kobanê dest pê kir, lê bakurê Sûriyê belav bû



Pîrozbahiyên salvegera Şoreşa Rojava dewam dikin. Li bajarê Reqayê bi wesîleya salvegera şoreşê bi beşdariya bi dehan kesan civînek hat lidarxistin. Di civînê de yek ji endamên Rêveberiya Sivîl ya Reqayê Ezîz Hesen di civînê de li ser girîngiya şoreşê axivî û got, "Şoreşa Rojava ji Kobanê dest pê kir û li hemû herêmên Bakurê Sûriyê; Efrîn, Minbic, Reqa, Tebqa û Dêrazorê belav bû."*R-2*

## Divê misogeriya navnetewî hebe



Navenda Têkiliyên Dîplomasî ya TEV-DEM`ê têkildarî salvegera Şoreşa 19`ê Tîrmehê, rewşa Efrînê û guftugoyên bi rejîma Sûriyê re, daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de hat got, "Ger misogeriya navnetewî tune be wê hevdîtinên bi rêjîmê re tu encamê bi xwe re dernexîne holê." *R-5*

## Îsraîl "Netewe-dewleta Cihû" yan e

Parlamentoya Îsraîlê (Knesset), pêşnûmeya 'Netewe Dewleta Cihûyan' pejirand. Serokwezîr Netenyahû biryar weke 'Gaveke dîrokî' nirxand. Netenyahû got; "Ev gaveke dîrokî ye, her bijî dewleta Îsraîlê. Pirjimariyeke zêde biryar da ku dewlet, bi xisleta xwe ya Cihû bigihije gelek nifşên pêşerojê. Piştî



122 salan Herzl, vîzyona xwe bi xwe pêk anî."

## Dagirkeran 6 sivîlên din revandin

Kiryarên dagirkeran yên li dij mirovahî li Efrînê berdewam dikin. Artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê 6 kesên sivîl ên din ji navçeya Cindirêsê ya Efrînê revandin. Heta niha derbarê çarenûsa kesên hatine revandin de ti agahî tune ye. *R-2*

## Rûsya û komên çekdar li Quneytra li hev kirin


Navenda Mafên Mirovan a Sûriyê ragihand Rûsya û komên çete yên li Quneytra li hev kirin da ku kesên şerker tevî malbatên xwe derbasî bakurê Sûriyê bibin. Navendê ragihand ku herêmên ku çeteyên Heyet Tehrîr El-Şam û Cebhet El-Nusra jî tê de ne bi sponsoriya Rûsyayê li hevkirin pêk hatiye. *R-2*

## Rewşa Awarte bi dawî bû lê tiştek neguherî

Li Tirkiyê ku ev du sal bû Rewşa Awarte hebû roja 18'ê Tîrmehê hat rakirin. Di nava van du salan de îşkence hatin kirin, mirov hatin girtin, mafên mirovan hatin binpê kirin, bi deh hezaran kes ji kar hatin avêtin, bi dehan saziyên sivîl û dezgehên ragihandinê hatin girtin. Tevî ku bi fermî rewşa awarte bi dawî bû jî lê li Kurdistanê tiştek neguheriye. *R-2*



## MSD û rêjîm ji diyalogê re amade ne



Serokê Şandeya Muxalefeta Hundir a Cenevreyê Elyan Meshed diyar kir ku helwesta MSD'ê ya ji bo çareseriya aloziya Sûriyê erênî ye û da zanîn ku rêjîm û MSD ji bo diyalogê amade ne. Meshed wiha got, "Mafê çarenûsê nayê wateya dest ji hev bê berdan û herêm ji hev bê qutkirin. Berevajî vê yekê, mafê çarenûsê daxwaza wekhevî, demokrasî, azadî û mafan e."*R-4*

## Em ê li ser xeta sêyemîn bimînin



Berpirsyarê Têkiliyên Derve yê TEV-DEM'ê Salih Muslim bi boneya salvegera 7'an ya Şoreşa 19'ê Tîrmehê axivî û diyar kir ku wan bi xeta sêyemîn dest bi Şoreşa Rojava kirin û wê vê xetê bidomînin. Mûslim got, "Weke hêzên Sûriyeyî tenê em û rejîm li meydanê mane. Eger rejîm demokratîkbûnê qebûl bike, em dikarin pê re li hev bikin." *R-4*

# Rûsya û komên çekdar li Quneytra li hev kirin

***Navenda Mafên Mirovan a Sûriyê ragihand Rûsya û komên çete yên li Quneytra li hev kirin da ku kesên şerker tevî malbatên xwe derbasî bakurê Sûriyê bibin. Navendê ragihand ku herêmên çeteyên Heyet Tehrîr El-Şam û Cebhet El-Nusra jî tê de ne bi sponsoriya Rûsyayê li hevkirin pêk hatiye.***

Rûsya li ser bajarokê Quneytra bi komên çekdar re li hev kir da ku kesên şerker tevî malbatên xwe herin bakurê Sûriyê yan jî bi rêjîmê re rewşa wan bê zelalkirin.
Navenda Mafên Mirovan a Sûriyê ragihand ku lihevkirin li ser çarenûsa Quneytra û hemû heremên wê bi sponsoriya Rûsyayê hatiye kirin, tevî herêmên di bin serweriya çeteyên Heyet Tehrîr El-Şam û Cebhet El-Nusra de jî.
Navendê destnîşan kir ku di lihevkirinê de hatiye erêkirin ku hemû kesên lihevkirinê napejirînin û malbatên wan wê werin şandin ber bi bakurê Sûriyê ve, tevî ku çekên xwe yên giran û navîn wê radest bikin û wê polîsên leşkerî yên Rûsyayê derbasî bajarok û gundên Quneytra bibin. Qeydkirina navên kesên ku li hevkirinê napejirînin pêk hat.
Ajansa SANA ya girêdayî rêjîma Sûriyê jî ragihand ku hin agahî hene li ser lihevkirinê û wê komên çekdar ên di parêzgeha Quneytra û Îdlibê de bên derxistin an jî wê sîstema dewletê bipejirînin.




## Aboriya Tirkiyê ber bi hilweşînê ve diçe



Dîrektorê Beşa Lêkolînê ya IMF ( Fona perayan a Navneteweyî ) Gîan Marîa Mîllesî-Ferrreti ragihand aboriya Tirkiyê ber bi hilweşînê ve diçe.
Dîrektorê Beşa Lêkolînê ya Fona Perayan a Navneteweyî (IMF) Gîan Marîa Mîllesî-Ferrettî wiha got; "Em li bendê ne ku Tirkiye îsal sedî 4.2 û sala bê 3.9 mezin bibe."
Di rapora DEG a IMG'ê ya roja Duşemê hatî weşandin de cih hate dayîn hêviyên mezinbûna îsal a Tirkiyê.
Di rapora meha Nîsanê de hatî weşandin hevîyên mezinbûna Tirkiyê ya sala 2018-2019'an de weke sedî 4.4 û sedî 4 hatibû eşkere kirin.
Mîllesî-Ferrettî diyar ku ku tengavbûna şert û mercên fînansa global, zêdebûna nirxê petrolê û bêqîmetbûna lîreyê Tirk bûne sedem ku di mezinbûna aboriya Tirkiyê de bêhêvî bibin.

# Rewşa Awarte bi dawî bû lê tiştek neguherî

Pêkanîna rewşa awarte (OHAL) ya di 20'ê Tîrmeha 2016'an de hat îlankirin û 7 caran hat dirêjkirin, 2 sal şûnde hat rakirin.
Pêkanîna OHAL'ê ya piştî hewldana darbeya 15'ê Tîrmeha 2016'an de hat îlankirin, di 18'ê Tîrmeha 2018'an de hat rakirin. Di çarçoveyê OHAL'ê de, 32 KHK (biryarname) hatin weşandin, 125 hezar û 800 peywirdarên cemawerî ji kar hatin avêtin, gelek sazî û dezgehên weşanê, weqf û komele hatin girtin.
OHAL'ê di pişt xwe de 2 salên tije, sansûr, êrîş, îşkence, girtin, qanûnên ne cezakirinê û binpêkirinên mafan hiştin.

### Lİ KOLANAN DÎSA MAŞîNEYÊN ZIRXÎ HENE

Li bajarê Amedê wekî her car maşîneyên zirxî yên polîsan li kolanên bajar tûr diavêjin û tundiya xwe ya li ser gel didomînin.
Bendên kontrolê yên polîsan ên ku qaşo di çarçoveya Rewşa Awarte de li cihên herî qerebalix ên bajar hatibûn danîn, hê jî li cihên xwe ne û nehatine rakirin. Bendên kontrolê yên li hemû deriyên Sûrê jî ku hê jî hin taxên wê ji ketina mirovên sivîl re qedexe ne, li cihên xwe ne û nehatine rakirin. Kesên ku bi wesayîtên xwe ango bi pêya dixwazin biçin Sûrê di kontrola polîsan de derbas dibin û wiha dikarin bikevin Sûrê û derên. Bendên kontrolê yên li ser rêyan nehatine rakirin.



# Li başûr û bakur 14 leşker hatin kuştin



HPG'ê ragihand ku di çalakiyên li Barzan a Başûrê Kurdistan û Çelê de 14 leşkerên Tirk hatine kuştin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê daxuyaniyek da û diyar kir ku li herêma Barzanê 5 û navçeya Çelê ya Colemêrgê jî 9 leşkerên Tirk hatine kuştin.
Daxuyaniya fermî ya li ser malpera HPG'ê hatî parvekirin ev agahî parve kir:
"Hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de, çalakiyên xwe yên li dijî hêzên dagirker ên Tirk didomin. "18'ê Tîrmehê saet 10:30'î li dijî leşkerên Tirk ên li Girê Xwedê yê li herêma Barzan a girêdayî xaka Başûrê Kurdistanê bi cih bibûn rêze çalakiyên sabotajê hatine kirin. Di van çalakiyan de 5 leşker hatine kuştin.
17'ê Tîrmehê artêşa Tirk a dagirker bi desteka balafirên keşfê yên bê mirova li devera Kanî Orê ya girêdayî navçeya Çelê ya Colemêrgê dest bi operasyonekê kiribûn. Hêzên me yên YJA Starê di heman rojê de li dijî yekîneyeke ya operasyonê ku xistibûn di bin kontrolê de saet 18:30'î çalakiyek lidar xistin. Di vê çalakiyê de 9 leşker hatin kuştin."

## Dagirkeran 6 sivîlên din revandin

Artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê 6 kesên sivîs ji navçeya Cindirêsê ya Efrînê revandin û çarenûsa kesên revandî ne diyar e.
Artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê li dijî sivîlên li Efrînê kiryarên dermirovî berdewam dikin. Artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê duh sibê 6 sivîlên navçeya Cindirêsê revandin.
Li gor ajansa ANHA'yê navên kesên ku hatine revandin wiha ne: Mistefa Heske (60), Nîhad Heske (58), Welîd Hisên (54), Ebdo Xelîl Ebdê (42), Bedrî Helebî (40) û Xelîl Muxtar (28).Her wiha çarenûsa van kesan hê jî ne diyar e.

## Bi hezaran kes gihiştin korîdora El-Îs



Karwanê otobusên kesên ku di bajarokê Kefreya û El-Fûa de asê mane, gihişt korîdora Tel El-Îs a gundewarên başûrê Helebê.
Li gorî dezgehên fermî yên çapemeniya Sûriyê roja Pêncşemê bi hezaran kesên ku di bajarokên Kefreya û El-Fûa de asê mabûn hatin rizgarkirin. Her du bajarokên gundewarên Idlibê ji aliyê komên çete ve hatibûn dorpêçkirin. Tê gotin ku wê rêjîma Sûriyê li beranberî wan bi sedan girtiyan berde.
Tê payîn wê nêzî 7 hezar kes ji her du bajaran bi rêya otobusan ber bi korîdora Tel El-Îs ve ya başûrê Helebê derkevin.
Roja 18'ê Tîrmehê jî 121 otobus û bi dehan erebeyên ambulans ên Heyva Sor a Sûriyê li ser 3 beşan derbasî bajarokê Kefreya û El-Fûa bûn ji bo ku kesên ku ev 3 sal e ji aliyê çekdaran ve hatibûn dorpêçkirin derxin.

# Îsraîl "Netewe-dewleta Cihû" yan e

Parlamentoya Îsraîlê (Knesset), pêşnûmeya 'Netewe Dewleta Cihûyan' pejirand. Serokwezîr Netenyahû biryar weke 'Gaveke dîrokî' nirxand.
Parlamentoya Îsraîlê, li hemberî 55 dengên 'na', bi 62 dengên 'erê' pêşnûmeya 'Netewe Dewleta Cihûyan' pejirand. Bi vî awayî di makezagonê de guhertineke bingehîn hat kirin û pêşnûmeyeke ku Îsraîl, weke netewe dewleta Cihûyan pênase dike, pejirand.
Gelek wekîlên Ereb û akademîsyenan bertek nîşanî vê biryara Knessetê dan.
Lê belê serokwezîrê Îsraîlê Bînyamîn Yetenyahû ji bo vê biryarê got; "Ev gaveke dîrokî ye, her bijî dewleta Îsraîlê. Pirjimariyeke zêde biryar da ku dewlet, bi xisleta xwe ya Cihû bigihije gelek nifşên pêşerojê. Piştî 122 salan Herzl, vîzyona xwe bi xwe pêk anî, bi vê zagonê me rêgeza xwe ya hebûnî kire zagonî. Îsraîl dewleta gelê Cihû ye û li hemberî mafê hemû welatiyan rêzdar e."



### ZAGONA HATÎ PEJIRANDIN

Bi vê zagonê re, nîşaneya stêrka ala Îsraîlê ya heft serî ku weke menûra (şamdana heft serî) ye, pênaseya 'paytext Qudûs e' fermî dibe.
Di zagonê de ji bilî vê, tê gotin ku zimanê fermî yê dewletê Îbranî ye û zimanê din Erebî ku niha fermî ye, tenê xwedî 'statuyeke taybet' e.

## Şoreşê ji Kobanê dest pê kir, lê bakurê Sûriyê belav bû

Rêveberiya Sivîl a Gundewarên Rojhilatê Reqayê bi boneya 6`emîn salvegera Şoreşa 19`ê Tîrmehê civînek li bajarokê El-Cedîda li dar xist. Civîn li navenda Meclisa Gel a bajarokê El-Cedîda hate lidarxistin. Endam, rêveberên komînan, saziyên xizmetguzarî û meclisên herêmî beşdarî civînê bûn.
Edamê Rêveberiya Sivîl Ezîz Hesen Di civînê de axivî û wiha got: "Şoreşa Rojava ji Kobanê dest pê kir û li hemû herêmên Bakurê Sûriyê; Efrîn, Minbic, Reqa, Tebqa û Dêrazorê belav bû. Şoreşê ji cîhanê re tekez kir ku gelê Bakurê Sûriyê aşiqê azadiyê ye û dikare xwe bi xwe li ser pîvanên rêveberiya azad bi rê ve bibe."



# Bi tekoşîna Lêgerîna Heqîqetê bi serkevin

***Koma şanoyê ya girêdayî Çand û Hunera Mexmûrê ku yekemîn car e derbasî Rojava dibe, li bajarê Kobanê û nih ali Herêma Cizîrê dest bi tura pêşkêşkirina şanoyek kirin. Rêvebirê Koma şano ya Hêvî Yekta ya Maxmûrê Bagêr Maxmûr diyar kir wê li hemû herêmên Cizîrê şano bên pêşkêşkirin."***

**Melek DEMÎRTAŞ**



Koma şanoyê ya girêdayî Çand û Hunera Mexmûrê ku yekemîn car e derbasî Rojava dibe, li bajarê Kobanê û nih ali Herêma Cizîrê dest bi tura pêşkêşkirina şanoyek kirin.

### LÎ WARGEHA BERWXEDANMÊ DEST PÊKİRİN

Koma Şanoyê ya Şehîd Hêvî Yekta ya Çand û Hunera Mexmûrê ku di 6'ê Tîrmehê de yekem car e derbasî Rojava dibe, ku yekemîn şanoya xwe bi navê Lêgerîna Heqîqetê li Kobanê û dema niha li Herêma Cizîrê pêşkêş dike.Têkîldarê mijarê Rêvebirê Koma şano ya Hêvî Yekta ya çand û hunera Maxmûrê Bagêr Maxmûr diyar kir ku me di riya berxwedan û hunerê şoreşa rojava naskir."
Bagêr ser armanca wan hatina Rojava û pêşkêşkirina şanoyê wiha got:"Ev nêzî 15 rojin ku em ji Kampa Mexmûrê hatine rojava, li Kobanê dest bi tura xwe ya pêşkşêkirina şanoya bi navê "Lêgerîna Heqîqtê" kir û sê rojan li wir man. Her wiha 15'ê Tîrmehê li bajarê Qamişlo Navenda çand û hunera Mihemed Şêxo jî hate pêşkşêkirin û wê li hemû herêmên Cizîrê bê li darxistin."

### SERKEFTİNA HİMBERÎ DAGİRKERÎ Û SÎXORAN TEKOŞÎNE

Bagêr bal kişand ser naveroka şanoyê û wiha pêde çû: "Ev 3 salin ku Koma Ş. Hêvî Yekta hatiye avakirin û gelek şano hatine pêkêş kirin, yek ji wan jî Şanoya Lêgerîna Heqîqtê ye û dema şano jî saetek û nîve. Şano li ser gundek Bakurê Kurdistanê ku di bin polîtîkayên dewleta Tirk a dagirker de tê asîmîlasyonkirin û bi rêya çeteyên olî de tê parçekirin û gondî jî li himberî van kiryar û sêxurên xwefrotî serî hildidin ji gund diqewitînin, ji ber ku heqîqet azadîye."

### Bİ ŞOREŞA ROJAVA RE HESTÊN PENABERİYÊ WİNDABÛ

Bagêr da zanîn ku kamba maxmûrê nêzî 25 salin ku penabirê bakurê Kurdistanê lê jiyan dikin, ji bo wê jî me xwest yekemîn car şanoya



xwe li Kobanê pêşkêş bikin û wiha dom kir: "Kobanê cihê berxwedan û şoreşê ye û binghea neketina kobanê, ji ber ku wargeha berxwedaniya Arîn Mîrkane, me xwest ku warê şoreş û berwxedaniyê nasbikin. Hemû qad di şoreşê de cih girtine me xwest ku em bandora şorşa 19'ê Tîrmehê di guhertina qada çand û hunerê jî di nasbikin, dê ku em jî ji tecrûbeya wan bigrin, her wiha di riya şanoya xwe de hestên xwe bi rojava re parvekirin."


### ÇAND Û HUNER BÛ BERDECVA ŞOREŞÊ

Çand û huner dikarîbû bibe berdevkê şoreşa Rojava, ji ber ku di vê şoreşê de netenê şerê çek hate bikaranîn hişmendî çandinî û hemû rêbazên şer li himberî gel hatin bi karanîn, ji bo ziman, çand, govend azadiya xwe şer kir."

### HEMÛ QAD Dİ ŞOREŞÊ DE XWEDÎ TEKOŞÎN E

Rêvebirê Koma Ş.Hêvî Yekta Bagêr Maxmûr diyar kir ku di qada çand û hunerê de emê sekeftina şoreşa 19'ê Tîrmehê bi can fîdayan û hunerê bi serketû wiha di dawîkir:"Ji ber emê di riya hunerê de şoreşa bidin nasîn û şerdikin, çawa şervan bi çek, rewşenbîr bi pênûsa xwe û huermend jî bi hunera xwe şer û tekoşîn dikin da ku serkeftina Netewa Demokratîk misoger bikin."

## Neynika hunerê



**Xelîl XEMGÎN**

Pispor û zanyaran wiha gotiye: "Tu bixwazî miletekî an civakekê nas bikî, berê çanda wê civakê nas bike." Ji ber ku çand û huner neynika civakê ye.
Ger civakek hebe, çanda wê civakê jî heye, ger çand hebe bêguman nasnameya wê jî heye.
Têkildarî vê mijarê nirxandineke Rêber Apo ya li ser xebatên çand û hunerê tê bîra min. Di salên 1990'î de digot; 'Xebatên çand û hunerê ji bo min wekî neynika tevgerê ye, bi vê rewşa we dinirxînim û dipîvim. Êdî texmîn ku dikim rewşa tevgerê di çi astê de ye.'
Çand û huner li gorî siruştî, mîtolojî, bîrdozî, aborî û serpêhatiyên dîrokî karakterê xwe diafirîne. Ketin û rabûn, pêşketin û çewisandin, xwebûn û asîmîlasyon li hemberî hev şer dikin. Nemaze jî di sedsala dawîn de pergala dagirker dixwaze bi qirkirina çandî encamekê bi dest bixe.
Di vî şerê hebûn û nebûnê de pêwîste hemû beşên civakê li xwe mikur werin ku di 20 salên dawî de di vejîna hunera gelekî û têkoşîna çanda berxwedêr de em lawaz man. Encamên vê yekê her roj zêdetir bi kambax diyar dibin. Dixwazim bala herkesî bikişînim ser vê kambaxiyê.
40 sal in Tevgera Azadiyê bi berdêlên giran gelek nirx afirandin. Ji bo hinekan derfetên têkoşînê, ji bo hinekan derfetên siyaset û bazirganiyê afirandine. Ji bo xayînan jî bû deriyê gepa nan û nandoziyê. Beşa çand û hunerê ji bo van hemûyan bû makyaja lêvsorkirin û çavkilkirinê.
Mebesta min takekes nîn in, yên di hembêza pergalê de bi aşkera ji pergalê re xizmet dikin, xuya ne. Lêbelê versiyoneke din jî heye ku bi şerbeta pergalê mezin bune. Lingekî xwe li cem pergalê ye û lingekî din jî gerok û bazirgan e. Li hemû qadan hespê xwe dibezîne.
Ger mirov behsa wan bike çend pirtûk û defter têrê nakin. Pêwîste mirov di mijara civakê de zelal û dirust tevbigere. Avakirina civakeke demokratîk û exlaqî daxwaza her kesî ye. Tişta esil pratîzekirina vê daxwazê ye. Berhem bi cewher, naverok û qasidê armanca xwe dibe berhem.
Strana ku dil û mêjiyên min bêçare bike, min ji doza civakê dûr bixe çi ferqa wê ji fîlma ku di kolanên biyanî de mirov serxoş û mest bike heye. Ger tabloyên min ji dêwla Leyla, Zîlan, Nûda, Sakîne Cansiz, Arîn Mîrkan, Barînan, cih bide periyên Charls, kevokên Romayê û stêrên New Yorkê ev hest û tilî dê çi bidin vê civakê.
Ger mebest hunera kurdî be û em xizmeta çanda xelkê bikin gelo em ê çi navî li vê hunerê bikin? Mîna gelek siyasetmedarên tirk, faris û ereb; dema pêdiviya wan bi kurdan hebe an jî di dawiya emrê xwe de dibêjin; ez jî kurd im.
Mixabin heta niha tu beşeka ji xelkê me xwe negihandiye asta kurdê hemdem û azad. Hem li gorî felsefeya berê dijîn û hem jî bandora wan di derdoran wan de dimîne. Li qeraxê bajarekî mîna Stenbolê xemilandina keçeke bedew, wesayîteke modela dawîn, çîroka aşiq û evîna derewîn, teqlîdkirin û kopîkirina pergala sosyetîk ji bilî dejenerekirin û birîndarkirina folklor û çanda kurdan tiştekî din nîn e. Pêdiviya keç û xortên kurdan bi tiştên wiha nîn e. Kesên ku dikevin van rolên qeşmertiyê bila baş bizanibin ku pêdiviya vê civakê bi qeşmertiya wan nîn e. Ken û henekên xwe bi çanda serdest û sosyetîk dikin. Lê belê ji bîr nekin ku pêdiviya pergalê ji bo pazîfîzekirina giyanê ciwanan bi wan heye.
Heta 15 rojên din, hûn her tim serkeftî û têkoşer bin…***Jêder – e rojname***

## Ji bo pêşketina hunerê rola ragihandinê çiye?



**Rotînda YETKÎNER**

Di warê teknolojiyê de, pêşketinên cîhana îroyîn qada ku gihiştiyê, dikare deriyên gelek mezin li ber hunerê veke û tû astengiyên dagirkeran neke kelem ji xwe re. Ev rastiya ragihandinê ger ku rast û ji bo pêşketina civakê were pêkanîn, berhemên hunerê di nava demek pir kurt de, dikare bighêje tevahî cîhanê û badora erênî an jî neyînî biafrîne.
Erê ev rast e, lê gelo ragihandina Kurdan, taybetî çapemeniya me û televziyonên êdî hejmara xwe gihiştiye sedan vê rolê çiqas pêk tînin? Rastî li vir pirsgirêkek gelek û gelek mezin heye. Tevgera Azadiyê ne wek dewlet be jî, lê qada ku afirandiye ji gelek dewletan bêtir bi bandore û derfetên mezin bi destxistiye. Ka em bi çavekê rast li rola van televziyonên kurdan binerin, heywax… rasti heywax. Ew derfetên ji bo propoganda siyaset û zimanên dagirkeran didin, ji sedî dehê wê ji bo huner û çanda kurdewarî pêkbînin bawerkin wê rewşa ku çand û hunera hatî xitimandin wê gelek çohêkan ji xwe re biafranda û weke ava Dijle û Ferat wê biherikiya.
Hûn ji min bawer nakin ka vekin televziyonên me, ên bakurî, başûrî, Rojava û rojilatî, ger we di van televziyonande ji weşanê heyî sedî deh weşanên resen li ser hunera kurdî dît, ez lêborînek mezin bixwazim û fedîkim ji van gotinên xwe. Gelo çima rewşa heyî wusa ye?
Ji ber ku siyaseta rojane ewqasî giraniya xwe daye ser propogandaya dij nerastiyen dijmin ku, êdî nema li ser çand û hunera ji bo gel bikare bifikire. Erê şoreşek Dijwar tê meşandin, raste divê derew û berovajîyên dagirkerên kurdistanê bên vala derxistin û ji bo wêya rojane siyaset bête meşandin. Lê neyê ji bîrkirin ku ev Şoreş ji bo paşerojên me, yanî ji bo zarokên kurdan tê meşandin, we got erê. Erê, ka wê demê di van televzonan de çima ji bo zarokan bernamên ziman, hunerî, çandî û perwerdehiyên jiyanî tune? Dev berdin ji hunera resen re cih veqetandin û bi bernamên bi bandor jêre derfet afirandin, ji bo zarokên me bikaribin bi zimanê kurdî biaxfin bernamên bi bandor mixabin tune ye.
Lê van televîzyonên me bîst û çar seat bi zimanê dagirkeran nuçe, bernameyên jiyanî diweşînin, gelo hun nafikirin ku van televziyona tenê kurd guhdar dikin û hûn bi destên xwe civakê asîmîle dikin??? Rojnamên me, ên herî bi bandor û bi nav û deng, tu dibê belkî ji bo zimanên dagirkeran pêş bixin di nava hawîrkanê dane. Xêr e, hey hewar û medet erê hunermend û hunera heyî xitimiye, lê ragihadin di warê KURDÎ de çi dike?
Mabesta min tenê rexne kirin nîne, lê ji bêzarî û ji bê çaretiyê divê min van gotina bigota, diêşim gelek diêşime. Ev cangorîtî, ev ecir, zordarî, koçberî û bi hezaran dert û kul ji bo em bikarin KURDÎ û li KURDISTANÊ bijîn bû ne? Ji kerama xwe em hemû carek din kûr bifikirin ka şaşitî di ku de despêkir. Silav û rezdarî ji bo cangoriyan.

# Heyva Sor a Kurd alîkariya Şehbayê dike

***Navenda Heyva Sor a Kurd li Şehbayê bi kêm derfetan heta niha 6 hezar û 807 nexweş derman kir. Ji rêveberên Heyva Sor a Kurd yê li Şehbayê Emmar Mihemed diyar kir ku wan heta niha gelek caran bang li rêxistinên navnetewî yên mirovî kirine lê ti alîkarî nedane.***



Navenda Heyva Sor a Kurd li Şehbayê bi kêm derfetan 6 hezar û 807 nexweş derman kir û mirina 5 zarokan a ku ji ber kêmbûna derman û alavên tendrûstiyê qewimîne jî belge kirine. Li ser wê Heyva Sor a Kurd bang li Rêxistinên Mirovî kir ku alîkariya şêniyên Efrînê bikin.

Piştî ku dewleta tirk di 20'ê çileyê de êrîşî Efrînê kir bi hezaran şêniyên Efrînê tevî kadroyên tendrûstiyê yên Heyva Sor a Kurd neçar man ji Efrînê derkevin û li navçeya Efrîn'ê Şêrawa û Şehbayê bi cih bûn.

Heyva Sor a Kurd ji bo pêşkeşkirina alîkariyên tendrûstiyê û dermankirina şêniyan dest bi xebatên jinûve bi rêxistinkirina endam û kadroyên xwe kir.

Heyva Sor a Kurd li herêmên Şehbayê û navçeya Şêrawa, li gundê Aqîbê yê navçeya Şêrawa, Kampên Berxwedan û Serdemê li navçeya Fafîn, li navçeya Ehrezê û navendek nû li navçeya Til Rifatê ya Kantona Şehbayê bi giştî 5 cihên dermankirinê vekir. Her wiha ji bo her cihek tenduristiyê hatin amadekirin.

Li gorî serjimariya Heyva Sor a Kurd li cihên tendrûstiyê, 6 hezar û 807 nexweş, ku di nav de 2 hezar û 677 zarok û hezar û 43 nexweşên jin in hatin derman kirin. Piraniya nexweşan ji nexweşiyên hundirîn, nexweşiyên jinê, hestî, dil, Leşmaniya, çerm, diran, çav, guh, penceşêr, sinir û nexweşiya kezeba reş bûn.

Li gorî serjimariyê hezar û 745 reçêtên dermanan li navçeya Ehrezê hatine serfkirin. Û li gorî daneyên ku kadroyên tendrûstiyê, ji ber kêm derman û alavên tendrûstiyê jî 5 zarok mirine.

Di çarçoveya kêmbûna dermanan de endamê Rêveber a navenda Heyva Sor a Kurd li herêmên Şehbayê û navçeya Şêrawa Emmar Mihemed tekez kir ku hemû cihên tendrûstiyê yên girêdayî wan ji ber kêmbûna alavên tendrûstiyê û dermanên weke antîkorên, pêvedana maran, dermanan wêranê, dermanên zarokan, şekir, dermanên xwînpestinê û dermanên nexweşiya jinan û her wiha kêmbûna kadroyên tendrûstiyê astengiyan dikşînin.

Mihemed diyar kir ku, wan gelek caran ji bo alîkariyê bang li Rêxistinên Mirovî yên Navneteweyî û Rêxistinên Mafên Mirovan kirine, lê heta niha tu alîkarî ji wan re nehatiye.

Di dawiya axaftina xwe de endamê rêveber ê Heyva Sor a Kurd carek din bang li hemû Rêxistinan kir ku alîkariya şêniyên Efrînê ku li Şehbayê dimînin bikin…*ANHA*

## Şoreşa Rojava şoreşa azadiya jinê ye

Jinên li Şehbayê dimînin şeşemîn salvegera Şoreşa 19'ê Tîrmehê pîroz kirin û gotin: "Wê têkoşîna azadiya jinê bi ruhê Şoreşa 19'ê Tîrmehê ku jin pêşengê wê ye, Sûriyeke demokratîk ava bike. Wê bi pêşengiya jinê dagirkerî û zihniyeta zilamê serdest jî têk biçe.

**JIN PÊŞENGÊN TÊKOŞÎNA AZADIYÊ NE**

Jina ji pêkhateya Ereb Heyat El Ehmed cihê xwe di Mala Jin li Fafîn digire. Derbarê şeşemîn salvegera Şoreşa 19 Tîrmehê de got: "Beriya aloziya Sûriyê jin di bin nîrê desthilatdariyê de êşên mezin dikişandin. Bi aloziyê re êşa jinan hê mezintir bû. Komên çete bi navê îslamê jinên Sûriyê bi kar dianîn û weke madeyeke kirîn û firotinê li sûkan dihat pêşandan. Lê bi Şoreşa 19'ê Tîrmehê re jinên Rojava û Sûriyeyî rûmeta wenda vegerandin. Jinê li ser koka xwe pêşengiya şoreşê kir. Hêzên xwe yên parastinê YPJ ava kir û ji civaka hatiye kolekirin re pêşengiya azadiyê kir. Jinan bi Şoreşa Rojava re têkoşîna azadiya jin ku Rêber APO afrînerê wê ye bi destê xwe bi rê ve birin. Şoreşa 19 Tîrmehê naşibe şoreşên dîtir ên dunyayê. Ji ber ku li Rojava, Bakurê Sûriyê jin pêşengê şoreşê ne. Ji ber vê yekê jî Şoreşa 19 Tîrmehê bi Şoreşa Jinê tê naskirin." Dawiyê de Elehmed bang li hemû jinan kir ku ji bo azadiya xwe tevlî nava refên Şoreşa 19'ê Tîrmehê bibin û asta têkoşîna xwe bilind bikin.

**WÊ SÛRIYEYA DEMOKRATÎK AVA BIBE**

Endama Dîwana Edaletê li Şehbayê Hêvîn Sîdo jî destnîşan kir ku jin beriya şoreşê bê teqet û bê helwest bû û wiha got, "Jin di nav çar dîwaran de li malan dihate hepiskirin. Lê bi Şoreşa 19 Tîrmehê re qeydên desthilatdariya hişmendiya zilam hatin şikandin. Jinan êdî ji bo azadiya xwe û civaka xwe li ser hîmên paradîgmaya Rêber APO têkoşîna xwe birêxistin kirin. Niha siyasetmedar, rêveber, dayîk, leşker, aborînas û diplomat e. Jin pêşengê Şoreşa Rojava û



Sûriyê ne. Jina Kurd bi pêşengiya xwe ji Şoreşa 19'ê Tîrmehê re û bi berxwedana li hemberî teror û dagirkeriyê bû pêşenga jinên cîhanê. Êdî cîhan rêgezên xwe yên azadiyê li gorî têkoşîna jina berxwedêr a Şoreşa 19'ê Tîrmehê destnîşan dike." Sîdo dawiyê de ev tişt anî ziman: "Çawa ku jina Kurd pêşengiya Berxwedan Serdemê kir, dê bi ruhê wê berxwedanê jî têkoşîna azadiya jinê li her derê belav bike. Wê bi ruhê Şoreşa 19'ê Tîrmehê jinên Sûriyê, welatekî azad û demokratîk ava bikin.


## Parêzeran navenda xwe vekir

Bi boneya salvegera 6'emîn a Şoreşa 19'ê Tîrmehê Encûmena Parêzeran li herêma Firatê navenda xwe vekirin.


Li bajarê Kobanê bi merasîmekê parêzeran navendeke xwe bi boneya salvegera 6'emîn a Şoreşa 19'ê Tîrmehê vekir. Meclîs ji 40 parêzeran pêk tê.

Di merasîma vekirina navendê de bi dehan endamên Rêveberiya Xweser û endamên navend û saziyan amede bûn. Merasîma vekirinê li Navenda Bakurî Qada Şehîd Egîd hat lidarxistin.

Di merasîma vekirinê de li ser navê Meclisa Edaletê Rewşen Hacim axivî û Şoreşa 19'ê Tîrmehê û vekirina navendê li mêvanan pîroz kir. Rewşen wiha got: "Em silavên xwe ji şervanên YPG'ê û YPJ'ê û Asayîşê re dişînin, ev 6 sal e gelê me têkoşînê dike, ji bo ku azad bijîn ketin nava saziyan û kar kirin, yek ji wan sazî û dezgehan jî saziya parêzeran e."…*ANHA*



## RAMANÊ RÊBERTIYÊ



### Sosyalîzm û Kapîtalîzm -3-

**Abdulah Ocalan**

Mirov dikare bibêje, di salên dawî yên temenê xwe de (1880-1883) li vê kêmanî û şaşiyê hayil bûye, hem li girîngiya diyardeya dewletê ya joravahî ye, hem jî li girîngiya civaka kominî ya berê hayil bûye. Eleqeya wî ji bo civaka Rojhilat zêde bûye. Di fikra xwe de hin alî sererast kirine. Lê belê xeta Rohnîbûnê di tevahiya dîroka sosyalîzma pêkhatî de serwerî Marksîzmê bûye. Şaşiya bingehîn a wê demê ev e: Bawer kirine ku ji civaka kapîtalîst bibihurin ango bi temamî di ser kapîtalîzmê re derbas bibin wê karibin civaka nû yan jî kominîzmê pêk bînin û heta di asta zanistî de ev yek weke 'sosyalîzma zanistî' bi nav û nirx kirine.

Di vê nêzîkatiyê bi xwe de jî du şaşiyên bingehîn hene: Ya pêşî, ne di zanistên fizîkî de, ne jî di zanistên biyolojîk de zanist xwedî hukmê vebirrî û ji sedî sed nîne (têkiliya vê yekê bi baweriya zêde ya bi zanistên demê re heye), ev rastiya ku paşê hatiye fêhm kirin nehatiye dîtin ango fêhm nekirine ku mirov nikare bi formulasyonên zanistî yên vebirrî rahêje xwezaya civakî û binirxîne. Xwezaya civakî bi xwe çand e. Bandora zêhniyetê ya di derekê de bi cih nabe her tim li ser heye. Lewma nabe ku mirov pîvanên xwezaya civakî bi yên fizîkî yan jî qanûnên biyolojîk ên Darwînîst re wekhev bibîne û di bingehê şaşiya wan de ev nêzîkatiya zanistî heye. Şaşiya duyemîn, dîrok bi felsefeyê re têkildar e. Nikarîbûne bibînin ku civak bi xwe diyardeyeke dîrokî ye, lê bi awayekî cuda divê weke xwezayeke duyemîn bê nirxandin. Jixwe nexwestine bibînin ku nihaya civakî bi giranî dîroka civakî ye. Fikra rohnîbûnê destûrê nade vê yekê. Ji vê û pêve jî nirxandinên kapîtalîzmê dimînin yên ku lîberalîzmê nava wan vala kiriye û bi fikreke çor a dinyayê hatine kirin. Kapîtalîzm weke civaka serdest, yekane û li gorî dema xwe ya herî pêşketî hatiye hesibandin. Kapîtalîzm ji şêweyekî mêtinkariyê wêdetir bi civaka nû re wekhev hatiye dîtin. Pêkhatina dinya-civakê bi mîlyonan belkî jî bi mîlyaran salî kişandiye. Lê belê rêbazeke îstîsmarê ya weke Kapîtalîzmê ya ku bi rêbazên herî zêde dermirovahî û lewra jî derdinyayî civaka mirovan dişelîne weke rastiya civakê ya bi ser ketiye hatiye hesibandin! Di paradîgmaya Marksîst de qelsiya bingehîn di vir de ye. Ango faktora bingehîn a bû sedema jihevdeketina sosyalîzma pêkhatî jî ev bû. Tevgereke sererastkirinê ya xwe bisipêre Marksîzmê yan jî sosyalîzma pêkhatî divê bi vê heqîqetê rabe. Sosyalîzm di asta têgînê de xwe weke civakparêzî eşkere bike rastir e. Ya şaş têgîna 'civaka kapîtalîst' e, û bi bihurîna ji civakê xwegihandina kominîzmê ye. Beriya her tiştî mirov heta çarçoveya civaka kapîtalîst (divê mirov modelên weke koledar, feodal û hwd. jî li vê zêde bike) baş destnîşan neke, divê têgîna civaka kapîtalîst weke heqîqeteke giştî ya civakî nenirxîne û ji vî şêweyî bigere. Ya herî rast ew e, divê mirov kapîtalîzmê weke nexweşiyeke civakî ya kujer, weke mezinbûna girêkeke civakî ya cureyê kansêrê binirxîne. Civakên ji wan re koledar û feodal tê gotin jî di nav de, tevahiya civakên beriya kapîtalîzmê şêweyên mêtinkariyê yên weke kapîtalîzmê bêexlaqiya herî mezin hesibandine û ew neçar kirine ku xwe di quncikên tarî de veşêre û bi awayekî marjînalbûyî bimîne.



# Şoreşa 19'ê Tîrmehê şoreşa jin e

***Koordînasyona KJK'ê bi daxuyaniyekê salvegera 7'an a Şoreşa 19'ê Tîrmehê pîroz kir û wiha got, "Şoreşa 19'ê Tîrmehê bûye şoreşa jinê. Ji bo ku em bikaribin Şoreşa 19'ê Tîrmehê, şoreşa jinê domar bikin, pêdivî pê heye ku pergala Neteweya Demokratîk bi hemû rehendên xwe were birêxistnkirin û yekîtiya jinên li Sûriyê û Bakurê Sûriyê were avakirin."***

KJK'ê Şoreşa 19'ê Tîrmehê li Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, li şehîdên Kurdistanê pîroz kir û got, 'Şoreşa 19'ê Tîrmehê bûye şoreşa jinê'.

Koordînasyona KJK'ê bi daxuyaniyeke niviskî salvegera 7'an a Şoreşa 19'ê Tîrmehê ya Rojava-Bakurê Sûriyê pîroz kir. KJK'ê di daxuyaniya xwe de got, ''Bi 19'ê Tîrmehê re vîna gelan careke din vejiya û mirovahî bi kêliya dirokî re bi awayekî zanistî li nirxên xwe xwedî derketiye. Bi vî nirxî re jî pergala dayikê ku bi hezaran salan hatibû desteserkirin li Rojavayê Kurdistanê bi rengekî berbiçav xwe daye der.''

KJK'ê bal kişandina ser rista jinê ya di Şoreşa 19'ê Tîrmehê de û got, ''Şoreşa 19'ê Tîrmehê bûye şoreşa jinê. Niha jî bûye modêlek ku her kes jê îlhamê distîne.''

KJK di daxuyaniyê de wiha got: "Rojhilata navîn cihê ku mirovahiyê tîrêjên xwe lê avêtiye û ev tîrêj, ronahî û germahiya xwe daye her derê cîhanê, bûye cihê hemû şoreşên ku ji bo mirovahiyê jiyana xwe li ser berdewam dike. Kok ji vir derketiye,ev kok esîl e û tu carî wê taybetmendiyên xwe ji dest nede. Ew taybetmendî ku bi rengê jinê xwe daye der, mîna civakîbûn, hezkirin, edalet, wekhevî, demokrasî û hwd.

Lê bi hatina hişmendiya desthilatê, her tiştê xweşik, ku civakan xwe bi rê ve dibir serûbinî hev kir. Xwe li ser kolekirina jinê,dizî



,talan,kuştin,şer ava kir û her tim di nav civakan de pirsgirêk çêkir. Pêngava 19' ê Tîrmehê li Rojhilata Navîn, ew pergala ku dagirkeriyê sînor ji bo mirovahiyê ji hev perçe kiriye, bûye pêngavek ku dawî li vê pergala pençeşêrê aniye, ew hilweşandiye. Ev jî bi fikir û felsefeya Rêber APO kiriye, ku ev fikir û felsefe carek din rih daye mirovahiyê û ew ji xewa mirinê şiyar kiriye, mêjiyê ku mirî bûye, zindî kiriye û dilê ku gemarî bûye paqij kiriye. Ango bi 19'ê Tîrmehê re vîna gelan careke din vejiya û mirovahî bi kêliya dirokî re bi awayekî zanistî li nirxên xwe xwedî derketiye. Bi vî nirxî re jî pergala dayikê ku bi hezaran salan hatibû desteserkirin li Rojavayê Kurdistanê bi rengekî berbiçav xwe daye der.

Bi 19 Tîrmehê re jin weke gelewêja berbangê bi şewq bû û kir ku her kes bala xwe bide ser. Ji ber vê sedemê îro şoreşa 19 Tîrmehê bûye şoreşa jinê. Ji bo ku em bikaribin Şoreşa 19'ê Tîrmehê, şoreşa jinê domar bikin, pêdivî pê heye ku pergala Neteweya Demokratîk bi hemû rehendên xwe were birêxistnkirin û yekîtiya jinên li Sûriyê û Bakurê Sûriyê were avakirin."

## Weqfa Jina Azad xizmeta zarokan dike

Endama Rêveberiya Weqfa Jina Azad a Rojava Yasmîn Hesen di derbarê kar û xebatên Weqfê û asta pêşketina xebatan de axivî û got: "Weqfa Jina Azad kar û xebatên xwe di çarçoveya xizmeta ji bo jin û zarokan de didomîne."

Weqfa Jina Azad di sala 2014'an de hat avakirin û wek navenda Weqfê ya Rojava xwe li bajarê Qamişlo ya herêma Cizîrê bi rêxistin kir. Weqfa Jina Azad a Rojava bi armanca avakirina proje û çalakiyên ku ji bo pirsgirêkên jin û zarokan çareser bike hat avakirin. Di derbarê kar û xebatên Weqfa Jina Azad a Rojava de Endama Rêveberiya Weqfa Jina Azad a Rojava Yasmîn Hesen da zanîn ku ew her dem ji dil û can ji bo çareserkirina pirsgirêkên jinê û zarokan dixebitin.

Yasmîn Hesen diyar kir ku Weqfa Jina Azad a Rojava li ser pênc beşan ava bûye û got: "Zarokên Rojhilata Navîn gelekî di bin bandora şer de mane. Weqif li ser beşên perwerde, ragihandin, tunduristî, ava- kirina proje-





yan, aboriyê hatiye avakirin. Ji bo zarokan qadên perwerdeyê, baxçeyê zarokan hat avakirin û perwerdeya muzîkê jî tê dayin. Ji bo jinan jî qadên perwerdeyê hat avakirin."

**JIN Û ZORAK PÊŞEROJ IN**

Yasmînê da zanîn ku jin û zarok hêviyên siberojê ne û wiha dewam kir: "Jin û zarok bingeha civakê ava dike loma ji bo wan me beşên tenduristiyê jî afirand. Ji bo tenduristiyê semîner hat lidarxistin, perwerde hat dayin. Navendên tenduristiyê li gelek cihan hat vekirin. Her wiha ji bo jinan cihê werzîşê jî hat vekirin. Ji bo aboriya jinê jî dirûngeh hatin vekirin. Li gelek bajaran park hatin vekirin."

Yasmînê da zanîn ku Weqfa Jina Azad li hersê herêmên Rojava hatin birêxtinkirin, li kampên Rojava jî xebatên xwe meşandin û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Li Kampa Şehbayê û yên dinê jî çalakiyên cur be cur ên ji bo koçberan hat kirin. Navendên tenduristî, dirûngeh, cihên werzîşê, li Kobanê ji bo 800 zarokên şehîdan Akademî hat vekirin. Her wiha ji bo jin û zarokan gelek çalakiyên hêja hatin lidarxistin û wê di vî warî de xebatên me bidomin. Weqfa Jina Azad a Rojava her dem di xizmeta jin û zarokan de ye."… *Civîn Husên-Delal Cemîl /Qamişlo*

## Jin bi kedê civakê li ser pêyan digire



Fatma Ebdulrehman EL-Alî ya ku karê dirûtinê dike û debara xwe dike. Fatmayê bang li hemû jinan kir ku têbikoşin, li ser lingên xwe bisekinin û nehêlin ku tu tişt li hemberî daxwazên wan ê jiyanî bisekinin.

Fatma Ebdulrehman EL-alî (31) bi dirûtina cil û bergan debara malbata xwe dike. Fatma dayika 5 zarokan e sê keç û du lawên xwe bi keda destên xwe mezin dike.

Fatmaya ku bi keda destên xwe debara xwe û zarokên xwe dike derbarê keda xwe de wiha got: "Ez karê dirûtinê ji jinek pispor hîn bûm. Ev bû derdora deh salane ku ez vî karî dikim. Ez zewicî me û bûm dayika 5 zarokan lê min dîsa jî dev ji karê xwe berneda. Ez bi vî karî debara malbata xwe dikim. Ji aliyekî jî ez hez ji karê dirûnê dikim. Lê dîsa ez dibînim ku gerek jin di warê aboriyê de xwe pêş bixe, ji ber ku jin bingeha civakê ye."

Fatmayê diyar kir ku heta dawî ew ê li keda xwe xwedî derkeve û wiha dewam kir: "Xwesteka min a kirina vî karî ew e ku ez xizmeta miletê xwe bikim û ji bo pêşxistina civakê gerek her tim jin jî xwe pêş bixe û ger mirov bixwaze ku tişkekî biparêze divê ku li keda xwe xwedî derkeve û bidomîne."

Fatma Ebdelrehman El Elî bal kişand ser keda jinê ya di nava civakê de û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Jin xwedî hêz û vînek mezin e, loma jî jin cihekî pir mezin di nav civakê de digire. Di her demê de divê ku jin bi keda destên xwe li xwe û civaka xwe xwedî derkeve û stûyê xwe tu caran li hemberî tu kesan netewîne. Lewra bi keda destên xwe jin li civakê xwedî derdikeve."…*Dîlber Mihemed /Serêkaniyê*

## Rêber Apo misogeriya azadiya jin ê



Parêzer Selwa Ecac destnîşan kir ku Rêberê gelê Kurd Abdulah Ocalan ji bo azadiya jinê û gelên bindest tekoşîneke bê hempa daye meşandin.

Derbarê tecrîda giran a li ser Rêberê gelê Kurd Abdulah Ocalan parêzera bi eslê xwe Ereb Selwa Ecac diyar kir ku Ocalan afrînerê felsefeya azadiya jinê ye. Ecac wiha got, "Dîlgirtina wî li dijî mirovahiyê zilma herî mezin e. Dewleta Tirk bi girankirina tecrîdê re dixwaze ramanên Rêber APO ji civakê qut bike û bê parastin bihêle. Bi taybet jî jinan dixwaze kole bihêle."

Ecac bi bîr xist ku Rêberê gelê Kurd Abdulah Ocalan di encama komployekî navneteweyî di de dîl hate girtin û wiha dewam kir, "Dewleta Tirk bi serkêşiya sîstema faşîst a AKP-MHP û Erdogan ev çend sal in tecrîd li ser Rêber Ocalan şidandiye. Bi tena serê xwe li girava Îmraliyê di nav çar dîwaran de hebisandiye. Destûrê nade malbat, parêzer û delegeyan ku serdana wî bikin. Bi vî rengî jî dewleta Tirk hiqûqa navneteweyî û ya hundirîn bi awayekî bê bext bin pê dike."

Parêzer Selwa Ecac dawiyê de ev bang kir: "Ji bo şikandina tecrîda li ser Rêber APO ez weke parêzer bang li sazî û dezgehên navneteweyî yên eleqedar dikim ku bi awayekî lezgîn mudexeleyî bê hiqûqî û destdirêjiyên dewleta tirk bikin û vê tecrîda giran li ser Rêber APO bişkînin. Azadiya Rêber APO misogeriya wekhevî, edalet û jiyana azad e…

## Kongreya Star 4 mehan de 60 doz çareser kir



Kongreya Star a herêma Şehbayê di nav 4 mehan de 60 dozên jinê li navçeya Til Rifet çareser kir.

Piştî ku artêşa tirk ya dagirker Efrîn dagir kir welatiyên Efrînê neçar man ku ji herêmê derkevin û li herêma Şehbayê bi cih bûn.

Kongreya Star jî li herêma Şehbayê xwe ji nûve çalak û birêxistin kirin.

Kongreya Star pirsgirêkên jinan di dema şer de derketine çareser kir.

Kongreya Star di destpêkê de rewşa jinên Efrînê bi serdana malên şêniyên Efrînê berî û piştî koçberbûnê dişopand û her wiha hemû pirsgirêkên wan di dema şer de guhdar dikir.

Endama Rêveber a Kongreya Star li Til Rifetê Rîhane Elo destnîşan kir kir ku piştî şêniyên Efrînê ji malên xwe derketin, destpêkê gelek tevlihevî di xebatên wan de derketin, lê piştre endamên xwe komî ser hev kirin û dest bi jinûve rêxistinkirina Kongreya Star kirin.

Rîhane diyar kir ku wan 3 rêveber nûnerên Kongra Star li navçeyê erkdar kirine, komîteyên xwe weke komîteya lihevanînê ava kirin û her wiha di her komînekê de endameke jin ji bo karûbarên jinan erkdar kirine.

Di çarçoveya perwerdeyan de Rîhane diyar kir ku perwerde girîngtirîn gavên ku Kongreya Star pê rabûye. Heftê carekê perwerde li ser girîngiya perwerdê, şerê taybet û li ser koçberbûnê tên dayîn.

Rîhane anî ziman ku wan piştî qedandina xebatên rêxistinî dest bi lidarxistina civînan ji hemû komînan re ji bo şopandina rewşa jinê kirin.

Her wiha Kongra Star bi riya civînan pirsgirêkên jinan guhdar kir û pirsgirêkên wan çareser kir.

Rîhane da zanîn ku wan di nav 4 mehan de 60 dozên jinan çareser kirin… *ANHA*

# PKK'ê salvegera Şoreşa Rojava pîroz kir

***Komîteya Rêveber a PKK'ê bi wesîleya salvegera Şoreşa Rojava ya 19'ê Tîrmehê daxuyaniyeke nivîskî weşand û got, "19'ê Tîrmeha ew roj e ku gelê Rojavayê Kurdistanê biryardarî û îradeya xwe ya ji bo jiyana azad nîşan daye. Em pê bawer in ku di sala heftemîn a Şoreşa Azadiyê ya dîrokî de wê gelên Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê, têkoşîna Sûriya demokratîk û Kurdistana azad ji her alî ve xurt bikin."***

Komîteya Rêveber a PKK'ê di salvegera şeşemîn de Şoreşa Azadiyê ya Rojava ya dîrokî li Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, li gelê Rojavayê Kurdistanê, Hêzên Azadiyê yên Rojava û hemû mirovahiyê pîroz kir.

Komîteya Rêveber a PKK'ê bi wesîleya salvegera Şoreşa Rojava ya 19'ê Tîrmehê daxuyaniyeke nivîskî weşand û got, "Li dijî her şêweyên êrîş û dagirkeriyê wê ruhê biratiyê û yekîtiya demokratîk a gelan xurtir bibe."

Komîteya Rêveber a PKK'ê bi wesîleya salvegera 6. a Şoreşa Azadiyê ya Rojava ya 19'ê Tîrmehê daxuyaniyeke nivîskî weşand. Di daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku 19'ê Tîrmeha 2012'an ew roj e ku gelê Rojavayê Kurdistanê biryardarî û îradeya xwe ya ji bo jiyana azad nîşan daye.

PKK'ê destnîşan kir ku îradeya jiyana azad a bi rûmet ku 14'ê Tîrmeha 1982'an di Rojiya Mirinê ya Mezin de hate nîşandan, 19'ê Tîrmeha 2012'an li Rojavayê Kurdistanê veguherî helwestea gel a nayê guhertin.

Di daxuyaniyê de hate ragihandin ku di sala heftemîn a şoreşê de wê şoreşa çandî û civakî ya gelê Rojava kûrtir bibe, hêza xweparastinê wê xurtir bibe û li ser bingeha yekîtiya Sûriya demokratîk têkoşîna siyasî geştir bibe.

Daxuyaniyê wiha dewam kir: "Weke ku tê zanîn, Şoreşa Rojava ya 19'ê Tîrmehê ku weke parçeyek ji şoreşên Kurdistan û Sûriyê derkete holê, li ser bingeha teoriya modernîteya demokratîk a Rêber Apo pêşî li Kurdistana azad, Sûriya demokratîk û Rojhilata Navîn a demokratîk vekir û rêya wê ronî kir.

Em pê bawer in ku di sala heftemîn a Şoreşa Azadiyê ya dîrokî de wê gelên Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê, têkoşîna Sûriya demokratîk û Kurdistana azad ji her alî ve xurt bikin, li ser vê bingehê hîn bêhtir pêşî li Şoreşa Rojhilata Navîn a demokratîk vekin. Li dijî her şêwe dagirkerî û destwerdana biyanî, wê ruhê biratiyê û yekîtiya demokratîk a gelan xurtir bikin. Di serî de li Efrînê wê li dijî dagirkeriya TC a faşîst a li gelek qadên Sûriyê, wê têkoşîna berxwedana şoreşgerî bi hev re û bi rengekî çalak geştir bikin, wê karê avakirina neteweya demokratîk li her qadê bi awayekî serketî bimeşînin."



## Em ê li ser xeta sêyemîn bimînin



Berpirsyarê Têkiliyên Derve yê TEV-DEM'ê Salih Muslim, li ser sala 7'an a Şoreşa Rojava axivî û destnîşan kir ku li dijî her şêwe êrîşan ew bi hêza gel li ser pêyan man. Muslim da zanîn, wan bi xeta 3. dest bi Şoreşa Rojava kir û wê li ser vê xetê bimînin.

Berpirsyarê Têkiliyên Derve yê TEV-DEM'ê Salih Mûslim salvegera 7'an ya Şoreşa 19'ê Tîrmehê ya Rojava nirxand.

Muslim da xuyakirin ku wm sîstemeke alternatîf ava dikin û got, "Em sîstemeke wisa ava dikin ku desthilatdarparêz nîne, berê xwe ne li desthilatdariyê ye û gel bi derfet û rêxistinbûna xwe, xwe bi rê ve dibe. Ji xwe me berî 19'ê Tîrmehê dest bi vî karî kiribûn. Ji bo ewlekariya gel, sazî hatibûn avakirin."

Salih Muslim destnîşan kir ku bi şoreşa 19'ê Tîrmehê re piştî ku wan rejîm ji herêmên xwe derxist ev rewş hîn bi bandor bû û sazî hîn bi rengekî azad ava bûn, bi pêş ve çûn. Muslim got, "gel bi hêza xwe bersiv da pêwîstiyên xwe û êdî bi hêza xwe li ser piyan sekinî."

Muslim ragihand ku saziyên gel hêdî hêdî ava bûn, şûna xwe girt û gel êdî baweriya xwe bi wan anî û wiha dewam kir: "Ji hêz û potansiyela xwe bawer kir. Hêdî hêdî dest bi rêvebirina xwe kir û tevlî pêvajoyê bû. Xeta me ya 3. bi vî rengî kete meriyetê. Bêguman piştî ku 19'ê Tîrmehê şoreşê dest pê kir, êrîş jî zêde bûn. Piştî çûyina rejîmê, komên din dest ji me bernedan. Bi taybetî rêxistinên bi navên cuda yên weke Cephet El Nûsra, Lîwa Tevhîd ku pişta xwe dispartin Tirkiyê êrîşî me kirin.

Hinekan ji me re gotin, 'Hûn cihêkar in', hinekan gotin 'hûn kafir in', hinekan gotin 'Hûn çima li cem me nasekinin', hinekan jî gotin 'hûn li cem rejîmê ne' û êrîşî me kirin. Her kesî êdî dest bi êrîşê kir. Me jî hewl da xwe biparêzin."

Salih Muslim da xuyakirin ku bi demê re xeta wan a sêyemîn ku hem nêrîn hem jî siyaseta wan e, bi pêş ket û her kesî jê bawer kir. Muslim got, "Piştî ku 4-5 sal di ser re derbas bûn, her kesî fêhm kir bê em kî ne, xeta me çi ye.."

Muslim destnîşan kir ku ew hîn jî ji rastiya xeta sêyemîn a alternatîf bawer dikin û got, "Serketinên ku me di nava 6 salan de bi dest xistin, şerê me yê xweparastinê û rûniştandina vê xetê, nîşan didin ku me rê û polîtîkayeke rast hilbijartine. Ev yek weke xetekê, rast e. Yên ku li dijî rejîmê şer kirin hemû pûç bûn."

Di dawiya axaftina xwe de Muslim bi bîr xist ku piraniya hêzên hewl dan rejîmê hilweşînin heliyan û got, "Weke hêzên Sûriyeyî tenê em û rejîm li meydanê mane. Eger rejîm demokratîkbûnê qebûl bike, em dikarin pê re li hev bikin. Yanî divê demokrasiyê, yekîtî, xwişk û biratiya gelan qebûl bike. Eger pîvanên ku me diyar kirine qebûl bike, em amade ne bi her kesî re li hev bikin. Me deriyê xwe li kesî negirtine. Em li ser rêya rast in û em ê bi ser bikevin."

## MSD û rêjîm ji diyalogê re amade ne

Serokê Şandeya Muxalefeta Hundir a Cenevreyê Elyan Meshed diyar kir ku divê rejîm û MSD ji bo çareseriyê diyalogê pêk bînin û got, bi dîtina min her du alî ji vê yekê re amade ne.

Li Sûriyê ji aliyekî ve şer bi dijwarî dewam dike, li aliyê din jî dengê ji bo diyalogê bilindtir dibe. Îdîayên li ser diyaloga di navbera rejîmê û rayedarên Bakurê Sûriyê her roj di çapemeniyê de cih digirin. Lê belê ev îdîa heta niha ji aliyê rayedarên Bakurê Sûriyê ve nehatine piştrastkirin.

Meslîsa Sûriya Demokratîk (MSD) di nava hefteyê de li bajarê Tebqayê kongreya xwe ya sêyemîn lidar xist. Ji hemû herêmên Sûriyê gelek hêz û kesayet tevlî kongreyê bûn. Piştî konrgeyê jî di navbera aliyan û rayedarên MSD'ê de hevdîtinan li bajarê Eyn Îsayê dewam kir.



Yek ji wan kesên ku beşdarî diyalogê bû Serokê Şandeya Muxalefeta Hundir a Cenevreyê Elyan Meshed e. Meshed diyar kir ku ew ji bo diyalogê hatiye wir û got: "Ji ber ku li vir diyalogeke Sûrî heye ez hatime. Ez helwesta MSD'ê erênî dibînim. Rast e, hinek tişt hene divê em bi hev re sererast bikin. Wek pênaseya nenavendîbûnê û mafê çarenûsê. Li gorî nêrîna min, mafê çarenûsê nayê wateya dest ji hev bê berdan û herêm ji hev bê qutkirin. Berevajî vê yekê, mafê çarenûsê daxwaza wekhevî, demokrasî, azadî û mafan e."

Meshed hewldanên siyasî yên ji bo çareseriya qeyrana Sûriyê jî erênî dît û got, her du aliyên sereke yên Sûriyê, rejîm û MSD amade ne li dora maseyê rûnên.

Meshed vê yekê weke "çare û hêviyê" dibîne û wiha dewam kir: "Serokê dewletê (Beşar Esad) vê dawiyê got, 'destê me vekirî ye ji bo diyalogê'. Li gorî min dîtî ji bo diyaloga bi rejîmê re, ti pirsgirêk li gel MSD'ê nîne."

Meshed di dawiyê de ji bo destwerdan û dagirkeriya dewleta Tirk a li xaka Sûriyê jî ev helwest nîşan da: "Tirkiye di esasê xwe de dewleteke ku dijminatiyê li Sûriyê dike. Lewma jî em di destpêkê de li dijî destwerdana Tirkiyê ne. Ji xwe niha dagirkerek li ser axa me ye. Em jî ji bo derxistina Tirkiyê ya ji ser vê axê amade ne."…*ANF*

## Şoreşa19'ê Tîrmehê ronesans e

Meclîsa Giştî ya PYD'ê salvegera 6'emîn a Şoreşa 19'ê Tîrmehê pîroz kir û wekî ronesansa Rojhilata Navîn bi nav kir.

Meclîsa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokartîk PYD'ê di daxuyaniya derbarê salvegera Şoreşa 19'ê Tîrmehê de ev tişt got:

"Rojhilata Navîn di encamên pergalên serwer de di nava qeyranê de ye. Li ser vê yekê pêwîstî bi şoreşeke nû hebû ku nirxên jiyana azad, nêrîna azad û jiyana aştiyane di nav xwe de bigire. Şoreşa 19'ê Tîrmehê bersiva vê yekê da. Çirûska wê ji Kobanê destpê kir û li tevahî herêmên Rojava û Bakurê Sûriyê belav bû û heya niha jî çirûska wê vêketiye ta armancên avakirina civakeke exlaqî û polîtîk pêk bîne.

Şoreşa ku hatî destpêkirin, siyaseta demokratîk û xeta sêyemîn esas girt. Di vê çarçoveyê de Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a ku ciwan û jin wekî hêza pêşeng a civakê esas digire hate damezirandin.

Di heman demê de, şoreşê pergala xweparastinê pêş xist. Hêza parastina xweser ya YPJ û YPG'ê damezirandin da ku li hemberî her êrîşan bibe bersiv. Rizgarkirina Kobanê û Reqayê û herêmên din ji terora cîhanê ya DAIŞ'ê serkeftina herî mezin bûn. Şoreşa 19'ê Tîrmehê asoyeke nû ji bo tevahî gelên Rojhilata Navîn afirand.

Şoreşa 19'ê Tîrmehê guhertinên nû di civakê de pêk anî û bi roleke mîna ronesansa Rojhilata Navîn rabû. Her wiha hişmendiya paşverû têk bir û hişmendiyeke şoreşgerî a ku bingeha xwe ji felsefeya Netewa Demokratîk digire pêş xist.

Wekî Partiya Yekîtiya Demokratîk salvegera Şoreşa 19'ê Tîrmehê li gelên Rojava û Bakurê Sûriyê pîroz dikin û soz didin şehîdên azadî û rûmetê ku em destkftiyên ku bi xwîna wan hatine qezenckirin biparêzin ta ku armancên wan ên demokratîkbûyîna Sûriyê pêk bînin."



# Divê misogeriya navnetewî hebe

***Navenda Têkiliyên Dîplomasî ya TEV-DEM`ê têkildarî salvegera Şoreşa 19`ê Tîrmehê, rewşa Efrînê û guftugoyên bi rejîma Sûriyê re, daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de hat got, "Ger misogeriya navnetewî tune be wê hevdîtinên bi rêjîmê re tu encamê bi xwe re dernexîne holê."***



Navenda Têkiliyên Dîplomasî ya TEV-DEM`ê bi girêdayî salvegera Şoreşa 19`ê Tîrmehê, rewşa Efrînê û guftugoyên bi rejîma Sûriyê re, daxuyaniyek da. Daxuyanî li Navenda Têkliyên Dîplomasî ya Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) li bajarê Qamişlo yê bi amadebûna gelek dezgehên çapemenî hate dayîn. Daxuyanî ji aliyê Berdevkê Navenda Têkiliyên Dîplomasî yê TEV-DEM`ê Kemal Akif ve hate xwendin.

Daxuyanî wiha ye:

″Em şoreşa 19´ê Tîrmehê pîroz dikin ku ji Kobanê destpê kir û bû bingehek girîng ji bo çareserkirina aloziya Sûriyê. Em bi navê dîplomasiya TEV-DEM`ê salvegera şeşemîn a 19´ê Tîrmehê em pîroz dikin û hemû şehîdên ku canê xwe feda kirine ji bo avakirina civakek demokratîk bibîr tînin.

Rewşa koçberan li Efrîn hîn pir zehmet e û ti alîkariyên navnetewî nehatine kirin. Dewleta Tirkiyê bi awayekî sîstematîk dagirkeriyê li wê derê pêş dixe, guhertina demografîk pêk tê û mal û zevî tên şewitandin. Lê civaka navnetewî ta niha bê deng e û ev bêdengî xizmeta ji dewleta Tirkiyê re dike. Her wiha meclîsa ku li Efrînê hatiye avakirin rewabûnê dide dewleta Tirk û meclîs rolek xerab li dijî Efrînê û gelê Sûriyê dilîze.

Ji bo guftugoyên bi rêjîmê re; di vê hefteyê de me bêhtirî 15 nameyan şandin gelek wezaretên derve yên biyanî, Ewropî û Ereb û saziyên civaka sivîl re, di nameyan de me bal kişand ser ku divê garantiyên navnetewî hebin da ku guftugo pêş bikevin, em dibînin ku ev garantî tine bin ev guftugo tiştkî bi xwe re naynin. Her wiha me daxwaza avakirina destûrek demokratîk kiriye û gerek îradeya Bakurê Sûriyê jî tê de hebe û eger tine be jî ew ti çaeseriyê bi xwe re nayne.″

## 19'ê Tîrmehê bû bihar û adar



Mihemed SEYDÎ

Gotina Rêber Ocelan a ji bo Şoreşa Rojava di destpêkê de ji bo hemû kurdistaniyan wiha bû. " destekê ji bo Şoreşa Rojava bikin, kes nikare Şoreşa Li Rojava înkar bike. Helwesta herî bi rûmet jî cih girtina li rex wê ye."

Ev gotina Rêber Ocelan bi riya Hevseroka HDP'ê ya niha Perwîn Bûldan ku 2013'an di şandeya serdana Îmralî ya ji bo çareseriyê cih digirt de hat ziman.

Tevgera Azadiyê û mayîna Rêber Ocelan li nava Gelê Rojava bingeha 19'ê Tîrmehê avakiribû..

Bûhara Ereban dihate bi navkirin, lê bûhara gelan bû û ji bo hêzên desthiladar jî bû payîz.

19'ê Tîrmehê rojekî nû di rûpela şoreşên cîhanê de mirov weke mînak dikare bibîne û bi navbike.. Ji roja destpêkê û heta niha ku ket sala xwe ya 7. li ser bingeh û xeta ku jêre hatiye xêzkirin dimeşe û didome.

Sal bi sal em bala xwe didin rojavayê kurdistanê û herêmên ku pêla Şoreşa Rojava xwe gîhand wir çawa guherîne, Herêm hatine rizgarkirin û li wir mohra şoreşê bi rengê nû derketiye hole.

Em vegerin roja ku çiroska vê bûharê li rojavayê kurdistanê di bajarê kobanê de pêket. Wekî kesek ji yên şahîdiya vê rojê, roja destpêkê ya çiroska şoreşa 19 Tîrmehê li kobanê dikarim wan kêliyan wiha bînim ziman.

Wê rojê di kolanên bajarê Kobanê de liv û tevgereke pir zêde hebû, ew tevger û kêfxweşiya li ser rûyê xelkê herêmê tenê di Cejna Newrozê de min didît.

Lê ew roj ne 21'ê Adarê, û demsala bûharê bû, ew havîn bû û 19'ê Tîrmehê bû.

Liv û tevgera ciwanan zêde bû , kesên temen mezin li pêşderiyên malên xwe li benda mizgîniyê bûn, zarokan nizanîbûn çi heye, lê dîsa jî pir kêfxweşbûn û li nava kolanan silogan bangdikirin. Gelek kesên xwe dûr didan û ditirsiyan jî hebûn, Ditirsiyan û şîretên xwe jî dikirin.

Lê ciwanên ku êdî tehemûliya wan nemabû û xwedî armanc bûn, li dora hemû saziyên dewletê yên li bajarê kobanê kombûbûn û endamên Rêjîmê xistibûn dorpêçê.

Tevî ku gelê kobanê gelek îşkence û teide ji endamên Rêjîmê dîtibûn û li ser destê wan gelek caran hatibûn girtin, dîsa jî bi sebir ji wan dixwastin xwe radest bikin û rê li ber pevçûnan bigrin.

Vê yekê jî bingeha xwe ji însaniyet û hestên mirovî yên di dilê van ciwanan de ku ji behra felsefeya rêber Ocelan digrin dihat. Îşkenc û zilm ji destê van sazî û navendên îstixbaratê dîtibûn lê nedixwastin bibin wek wan û wekî wan nêz bibin.

Bi vî awayî tevger bi encam bû û endamên hêzên Rêjîmê yek bi yek hatin girtin, Hemû dever hatin bi dest xistin, alên rêjîmê hatin daxistin û alên Kesk, Sor û Zer li ser avahiyan hatin bilindkirin.

Reng û rûyê bajar guherî, dayîk û bav yên bi hesret li benda van rojan bûn, mizgînî girtin. Zarokên wan li hemû deveran ala rengîn bilindkirin. Li ser avahiya Sereke ku cihê payebilindê Rêjîmê bû û bi navê 'Serayê" dihate naskirin ala rengîn ku dîmenên wê kêliyê heta niha di hişê min de aliqî maye hate daliqandin.

Çawa Newroz û şeva Newrozê tê pîroz kirin, Wê rojê jî bi daliqandina alan, mizgîniya ku Kawa yê Hesinkar bi pêxistina agir îlankirina dawiya dehaq da, ji bo hemû rojavayê kurdistanê jî îşareta serketinê hat dayîn.

Bûhar û Şoreşa li Rojava beriya 6 salan wiha dest pê kir û heta niha bi gavên mezin didome.

## Em li Efrînê weke xerîban bûn



Welatiyê bi navê A.Y bi zehmetî xwe ji kiryarên artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê yên li ser Efrînê xilas kir û xwe gihand Şehbayê. A.Y niha tevî malbata xwe li gundê Mera Mislemiyê dimîne.

Ji destpêka ku artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê Efrîn dagirkirine gelek şêniyên Efrînê yên ku heta niha li wê derê dimînin hewil didin ku xwe ji zilm û kiriyarên dewleta tirk a dagirker û çeteyên wê rizgar bikin.

Welatiyê bi navê A.Y yek ji kesên ku ji Efrînê derket û xwe ji zilm û zora çeteyan rizgar kiri ye. A.Y, kiryarên ku çeteyan li ser sivîlan pêk di anîn, vedibêje.

A.Y dibêje komên çete ji destpêkê ve hewil didan ku şêniyan bi gotinên azadî û aştiyê bixapînin û bandorê li raya giştî bikin her wiha şêniyan bi darê zorê ber bi herêmên Şehbayê ve derxînin.

Lê rewşa wê derê zû hate guhertin û rastiya çeteyan û kiriyarên wan ji revandin, êşkencekirin, kuştin her wiha talankirin, wêrankirin û şewitandina mal û milkên welatiyan derketin holê.

Li gorî A.Y rewş li wê derê roj bi roj ber xirbûnê ve diçe û bi taybet piştî hilbijartinê tirkiyê welatiyan bi hincetên derew bê ser û ber digrin.

A.Y got da zanîn ku komên çete sivîlan digrin û beranberî berdana wan pereyan ji malbatên wan dixwazin û piştî ku wan berdidin careke din bi hincetên derew wan kesan digrin.

A.Y destnîşan kir ku, rakirin û şewitandina daran bi hinceta ku şervanên YPJ/YPG`ê li wan deran hene, didome.

A.Y diyar kir ku çete her dem ji şêniyan re dibêjin ku ew tu carî dev ji wan bernadin heta ku hemû mal û milkên wan talan bikin.

A.Y wiha axivî, "tiştên ku li Efrînê diqewimin ji durî pîvanên mirovahiyê ne û ev tişt anî ziman,"Rewşa li wê derê nayê tehemul kirin. Em li Efrînê weke xerîban dijîn. Efrîn, nema Efrîna berê ku di nav aramî û aştiyê de bû. Psîkolojiya welatiyan tevlî hev bûye. Her kes li hêviya şervanên YPJ/YPG`ê ne ku Efrînê ji artêşa dagirker a tirk û çeteyên wê rizgar bike."…*ANHA*

## Encamnameya kongreya KCDK-E'yê hate eşkerekirin

KCDK-E'yê encamnameya kongreya xwe ya sêyemîn ku çend roj berê li dar xistibû eşkere kir .

Kongreya Civakî ya Demokratîk a Kurdistaniyan a Ewrûpayê (KCDK-E) kongreya xwe ya sêyemîn di navbera 8-15'ê Tîrmehê de li dar xist. Ji Avûstralya, Kanada, Japonya û ji welatên Ewrûpayê nûnerên navendên civakî, federasyon, yekîtî û saziyên jin û ciwanan tevlî kongreyê bûn.

Dîwana Hevserokatiya KCDK-E'yê di encamnameyê de diyar kir ku ji bo hevserokatiyê Fatoş Goksungur û Yuksel Koç hatine hilbijartin.

Di encamnameyê de ev tişt hatin diyarkirin:

**RÊBERTIYA AZAD, JIYANA AZAD**

"Li ser esasê azadkirina Rêber Apo ji bo plansaziya pêvoya çalakiyê, ji aliyê rêveberiya me ve biryar hatiye dayîn. Li ser vî esasî ew ê tevlêbûna van çalakiyan di asta bilind de be. Ji bo çalakiyên Rêber Apo ew ê pêkhateyên KCDK-E'yê tevlê bibin. Kongreya me kampanyaya geşkirina 'Ji Ocalan re azadî' wekî peywir daye pêşiya xwe. Li gorî vê kampanyayê ew ê panel, sempozyûm, meş, mîtîng û çalakiyên kolanan werin lidarxistin.

**YEKÎTIYA NETEWEYÎ Û TÊKOŞÎNA HEVPAR**

Di kongreya me de ji bo sekinandina êrîşên li ser gelê Kurd ew ê têkoşîna bi yekîtiya neteweyî û giyanê seferberiyê tevî saziyên Kurdistanî yên li her çar parçeyan ew ê têkoşîn were kirin.

Di kongreya me de ev tişt derketiye holê bi têkoşîneke hevpar a yekîtiya neteweyî û hêzên demokrasiyê ew ê faşîzma AKP-MHP'ê were sekinandin.

Di kongreya me de biryar hatiye dayîn ku di serî de Elmanya, ew ê li dijî krîmînalîzasyona li ser saziyên Kurdan ên bi destê Tirkiyeyê were derketin. Ji bo ku ev zext were sekinandin û ji bo ku koçberên Kurd ên li Ewrûpayê karibin bi nasnameya xwe jiyana xwe bidomînin, ew ê xebat werin kirin.

**TÊKOŞÎNA SAZKIRINA JIYANA HEVPAR**

Di kongreya me de yek ji biryarên girîng jî ev e ku ji bo guherîn û veguherîna civakî, ji bo avakirina civakeke wekhev û ji bo pêdiviyên di warê çand, perwerdehî, civakî û siyasî li NAVEND'an ew ê proje werin çêkirin. Yek ji peywira sereke ya navendên me yên civakî û saziyên me jî ev e ku civakeke demokratîk ava bikin. Ji ber vê jî divê li dijî paşverûtiyan têkoşîn were dayîn û xebatên civakeke azadîxwaz were xurtkirin. Di vê têkoşînê de divê qirkirina ser jinan were rexnekirin û li dijî paşverûtiyan têkoşîn were kirin.

**PERWERDEHIYA ZIMANÊ DAYÎKÊ**

Yek ji krîtera nirxên mirovayetiyê jî perwerdehiya bi zimanê zikmakî ye. Divê gelê Kurd ji vî mafê mehrûm nemîne. Dewletên ku Kurdistan kirine mêtingeha xwe, Kurdî û çanda Kurdewar asteng dikin. Tê zanîn ku gelê me li dijî van êşkence û zextan têdikoşin. Biryar hate dayîn ku xebatên ji bo zimanê zikmakî û Kurdî werin geşkirin.

Kongre bi şîara 'Serî Hilde' û 'Jiyana azad a bi Ocalan re' biryar da ku li dijî mêtingeriya Tirkan li ser esasê azadî û wekheviyê têkoşînê geş bike."